# JI SED SAL BERÊ HETA NIHA: HESTÊN NETEWÎ Û SIYASETA KURDAN

**Assistant Prof. Dr. Necat KESKİN**
**Kurdish Language and Culture Department**
**Mardin Artuklu University**

**Destpêk:**

Rojhilata Navîn di nav guhertinek dijwar de diherike, zemînekî şemîtokî ye û berî her tiştî divê siyasetmedarên ku li ser vê zemînê polîtikayan ava dikin, an jî dixwazin polîtîkayan ava bikin hay ji vê yekê hebin. Ji ber ku ev kes bi çalakiyên xwe her weha bandorê li ser çarenusiya gelê xwe jî dikin.

Ji aliyekî ve neçareserbûna pirsgirêkên olî (ya herî sereke şîa û sunne ye), ji aliyê din sînorên nexwezayî yên ji derve ve hatine xêzkirin ku gelek komên civakî, olî, çandî di nav xwe de dihewîne û li himber vê 'pirçandîbûn'ê desthilatdarên otorîter ên ku naxwazin mafên van koman bi wan bidin vê zêmînê her wext şemîtokî dihele û dibin sedema şêr di vê qadê de.

Buyerên ku wek 'bihara ereban' tên binavkirin jî li ser vê zemînê derketin meydanê. Wek tê zanîn 'bihara ereban' di sala 2010an bi xwepêşandanê li Tunusê destpêkir û di wextekî kurt de li wan welatê din ên weke Lîbya û Misir, Yemen û ya dawî Surî belav bû.[1] Lê divê bê zanîn ku buyerên civakî ji ber xwe ve û bi carekê re dernakevin, bingeheke wanî dîrokî, aborî, siyasî, çandî he ye û di nav demê de dipijin hetanî bi awayekî derkevin ser ruyê erdê. Buyerên di Rojhilata Navîn de jî bi vî awayî ne û her çiqasî di dema osmaniyan de ev pirsgirêk bi perdeyek olî hatibin veşartin -dikare bê gotin bi rêbazek ademî-merkezî ku her 'çandek' xwedî mafê xwe bû- jî piştî fikra netewebûnê careke din derketin ser ruyê erdê. Yanî, bi gotineke din bingeheke dîrokî ya van şer, pevçûn û guherînên îro he ye û ji bo famkirina rewşa îroyîn divê careke din û bi hurgulî paşeroj, dîrok, şert û mercên demê bên nirxandin. Ji bo Rojhilata Navîn ku bandor li rewşa wê ya îro kiriye jî wek şerê cihanê yê yekemîn, hevgirtinên wê demê û encama wê derdikeve meydanê.

Ev şer, hevgirtinên siyasî yên wê demê, encamên şer belkî ji her gelekî zêdetir bandor li ser gelê Kurd ku gelekî di navenda 'rojhilata navîn' de ye kir. Rewşa îro ya kurdan jî careke din bi wan deman re têkildar xuya dike. Ji ber vê yekê jî di vê xebatê de dê bi kurtasî hinekî behsa paşeroja rewşa kurdan bê kirin, di çarçoveya netewebûn û hestên netewî de bêhtir li ser buyerên 'iroyîn" dê rewşa kurdan ya îro, hestên netewî, siyaseta kurdan bê nirxandin û di dawî de jî wek encam dê amaje bi hinek pêşbîniyan bê kirin.

**Kurte nêrînek li paşeroja Kurdan ya sedsala 19mîn- 20mîn:**

Guhertinên li Ewropa yên di sedala 19mîn de û geşedana hişmendiya neteweperwerî di demeke nêzîk de bandor li împaratora Osmanî jî kir. Gelên ku herî pêşî ev fikir girtin û li pey vî fikrê netewî çûn jî bêhtir gelên xiristiyan ên ku di nav dewleta osmanî dijîyan bûn. Hê di sala 1812an de gelê Sirb li himberî Dewleta Osmanî serî hildan û di serî de hinek îmtîyaz û piştre di sala 1929an de jî mafê xweseriyê bidestxistin. Lê yên pêşî ku ji împaratoriyê veqetiyan gelê Yewnan bû ku di sala

1 http://library.fes.de/pdf-files/iez/09609.pdf 29.12.2015

1926an de serxwebûna xwe bi dest xistin. Tekoşîna netewî ya gelên di bin desthilatdariya Împeratoriya Osmanî de heta hilweşîna împaratoriyê dewam kir.

Serok û rayederên Dewleta Osmanî ji bo ku rê li ber windakirina axê, têkçûna sîyasî bigirin û li himber pêşketina dewletên Ewropî dewleta xwe biparêzin dest bi hinek hewldanên sîyasî kirin ku wek 'tevgerên modernkirinê' tên nirxandin.[1]

Fermana Tanzimatê ya da di sala 1939an û ya Islahatê ya di sala 1956an du mînakên herî girîng in ku bandora xwe raste rast li ser rewşa kurdan a siyasî, aborî, çandî jî kiri ne. Bi van 'ferman'ên ku wek destpêka 'modernizasyon'a Dewleta Osmanî bûn, kurd jî ru bi ruyî windakirina mafê xwe hatin.

Kurd ji serê sedsala 16mîn heta nîvê sedsala 19mîn wek mîrektiyên xweser di nav axa Kurdistan de jiyana xwe domandin. Ev yek ji li ser 'hevgirtin'a Kurd û Osmaniyan pêk hatibû. Îdrîsê Bitlisî li ser navê eşîrên kurdan bi padişahê osmanî Selîmê Imîn re peyman çêkir û di encamê de bi şertê ku kurd di axa xwe de xweser bijîn di şerê navbera Osmanî û Îraniyan de alîkariya kurdan bo Osmaniyan temîn kir. Bi vê yekê jî Dewleta Osmanî di şerê li himber Dewleta Sefewî de bi ser ket. Destkeftiya kurdan jî ew bû ku kurdan 333 salan, ji 1514an heta damezranda eyaleta Kurdistan ya di sala 1847an de, di bin desthilatdariya Osmaniyan de lê wek mîrektiyên xweser jiyane xwe domandin (Hakan 2007:253).

Di destpêka sedsala 19mîn de, wek li jor jî hat gotin, êdî ji ber geşedanên teknolojîk û leşkerî û her weha, aborî, çandî û siyasi Dewleta Osmanî ber bi têkçunê ve diçû û ji bo ku rê li ber vê têkçûn û paşdemayînê bigire jî ket nav hewldanan ku bi şerê bi mîrektiyên kurdan re encam da. Mîrekên kurdan ji bo ku 'xweseri'ya xwe winda nekin serî hildan û di dawiyê de jî hemû ji ber ku wek Yewnan an jî Sirban û ên din ne bi hestên 'netewî' lê bêhtir bi armancên ku mîrektî û xweseriya xwe biparêzin serî hilda bûn yek bi yek têk çûn. Pêşî mîrektiya Baban, û dû re Botan û Hekarî di şerê bi Dewleta Osmanî re 'xweserî'ya xwe winda kirin. Di dawiya şerê di navbera Dewleta Osmanî û mîrekên kurdan de, ku ya dawî bi serhildana Yezdîn Şêr di sala 1956an de bû, eyaleteke bi navê Kurdistan hat ava kirin (Hakan 2007).

Piştî têkçûna mîrektiyên kurdan li Kurdistanê di hêla rêveberiyê de valahiyek derkete ser ruyê erdê û ev yek jî bi piranî ji hêla şêxên Neqşbend ku xelifeyên Şêx Xalid El-Kurdî (El-Şarezorî) bûn hat dagirtin û piştî wî wextî êdî di nav jiyana civakî ya kurdan de ev kesên oldar roleke girîng lîstin. Şêx Ubeydullahê Nêhrî yek ji van kesan bû û tevgera wî ji hêla gelek kesan ve îro jî wek tevgerek/serhildanek 'netewî' tê nirxandin. Kesên ku Şêx Ubeydaullah û serhildana wî wek serhildanek 'netewî' dibînin, gotineke ku dibêjin ya wî ye ji vê yekê re dikin bingeh. Ev gotin di nameya ku Şêx Ubeydullah ji mîsyonerên Emerîki Dr. Cochran re şîyandiye de cih digire. Di vê nameyê de Şêx Ubaydullah wiha dibeje;

> Milletê Kurd ku ji zêdeyî 500.000 malbatan pêk tê gelekî [netewe] cuda ye. Dînê wan ji yên din cuda ye û qanûn û adetên wan jî cuda ne...Em jî netewekî cuda ne. Em jî dixwazin karê me di destê me de be ku bi vî awayî em di cezakirina sûçdarên xwe de bihêz û serbixwe bin û bikaribin wek neteweyên din bibin xwedî imtiyazan...armanca me ev e… (Özoğlu 2009: 99; Jwaideh 2004: 153-156; Celîl 1998: 65).

Lê wek Özoğlu jî dibeje, her çiqasî hinek 'hestên netewî' di nav xwe de bihewîne jî rasterast ne wek serhildanek 'netewî', lê bêhtir wek Brunissen jî dibeje wek tevgereke proto-netewî/neteweperwerî dikare bê nirxandin (Bruinessen 1991:) Her wiha hewldanên ku piştî

1 Di derbarê modernîzma li dewleta Osmanî bnr. Kemal H. Karpat (2014). Osmanlı Modernleşmesi; Ji bo tekiliya netewebûn û modernîzmê di dewleta Osmanî de bnr. Suavi Aydın (1993). Modernleşme ve Milliyetçilik.

serhildana Şêx Ubeydullah derdikevin jî dikarin di vê çarçovê de bên nirxandin.[1] Çi rojnameya 'Kurdistan', çi kom û komeleyên din yên kurdan, her çiqasî navê 'kurd, kurdistan' di navê dezgeh, weşanên wan de hebin jî raste rast referansê nadin welatekî serbixwe ku di fikra netewî de cihekî girîng dilîze. Ji ber vê yekê jî wek Özoğlu (2009:33) tine ziman; *"referansê derbarê Kurd û Kurdistan ne neteweperweriya Kurdî, lê hebûna xwehişyariya (self-consciousness) kurdîtî'yê nîşan dike"*.

Ji ber vê yekê jî rewşenbîr, serok û paşayên kurdan wê demê xwe bêhtir di çarçoveya nasnameya 'osmanî' û di bin banê xelîfe de dibînin.

Vê yekê M.Emin Bozarslan weha tîne ziman;

> Tiştê balkêş ev e ku, neteweevînî û welatevîniya ku di rojnama 'Kurdistan' da cî girtiye û hatiye karanîn, ne ber bi amanca serxwebûna Kurdistanê bûyê; bi peyveke dî, amanc ji neteweevînî û welatevînîyê ne ew bûye ku Kurdistan ji dewleta Osmanî bê rizgarkirin û li ser axa Kurdistanê dewleteka Kurd a xweser bê sazkirin (Rojnameya Kurdistan, c.1, r.23).

Tê xuya kirin ku rojnameya *Kurdistan* an jî serok û entelijensiya ya kurdan ya wê demê ji parastina welatekî serbixwe bêhtir li ser dijberîtiya Evdilhemîd disekînî.

Wek mînak di jimareya 16an ya rojnameya *Kurdistan* de di sernivîsa xwe ya bi navê 'Îtîzar' Evdirehman Bedirxan weha dibêje;

> Heçîyê Musulman e, divê ku dewleta Osmaniyê baqî bimîne. Wekî me dît ku cismê dewletê ji sûê îdareyê merîz e [nexweş e] divê em vî cismî tedawî bikin, esbabê [sedemên] merezê îzale bikin [ji holê rakin]. Saxiya dewletê saxiya me ye, mirina wê mirina me ye.

Di heman nivîsê de Bedirxan wiha didomîne gotina xwe;

> Dewleta me 'Dewleta Osmanîye' ye; eve eyamek e [dem] ji sûê îdara Padîşahî gelek zeîf û zebûn bîye. Heger em, ku efradên dewletê ne, îlacekî nekin, la semehellah, înqîraz melhûz e [têkçûn, parçebûn diyar e, pekan e].[2]

Diyar e ku Kurd hîna jî xwe parçeyek ji Dewleta Osmanî didîtin û armanca wan ya sereke 'tedawîkirin'a êşa Dewleta Osmanî bû ku ev êş wek Siltan Evdilhemîd dihat dîtin. Ev yek jî dide xuya kirin ku bandora 'jon Tirk'an li ser rewşenbîrên Kurdan hebu ye.[3]

Ji aliyê din ve ji nivîsên di hejmarên piştre yên rojnameya *Kurdistan* tê xuyakirin ku ev nêrîn hinekî hatiye guhertin. Wek mînak di hejmara 27an de (1901) Evdirehman Bedirxan di sernivîsa xweyî bi navê 'Ji Kurdan re', behsa kurdan û axa wan dike. Di vir de êdî fikra ku kurd 'netewe'yeke cuda ne, zelaltir xuya dike. Di vê nivîsê de rexne li rewşenbîr û serokên kurdan tên kirin, qetla ermeniyan û dijberîtiya kurdan li himberî wan tê nirxandin, tirk wek 'ên din' tên nîşankirin ku di fikra netewî de tiştekî girîng e. Di nivîsê de her weha fikra 'welat' jî bêhtir derdikeve pêş.

> "Eve hev qasî sal e [h]un *xizmeta Tirka dikin, we çi qencî dît*? Muqabilê hev qasî zulma hukumetê, wekî we nîşanek an rutbeyek stand, [h]un mexdûriyeta xwe ji bîr dikin. (...)Berî penc sed sala tu Tirkek li *welatê me* de nebî. *Ev Tirk hemî ji Tûran hatin welatê me, û welatê*

1 Divê bê zanîn ku Şêx Ubeydullah di şerê navbera Osmanî û Rusan de bi hezaran şopînerên xwe li rexê Osmaniyan şer kiriye. Her weha Şêx Nasirê Tello jî alikariya Osmaniyan kiriye. Jwaideh (2004:226) wiha dibêje: "Di şerê 1877-78an de, em dizanin ku kurdan jî wek gelên din ên osmanî bi dilsozî di nav arteşa osmanî de xizmet dane".

2 Wergerên ji rojnameya Kurdistan ku li vir hatine nivîsîn ji çapa ku M. Emîn Bozarslan latînîze kiriye û ji nû ve çap kiriye hatine sitandin.

3 Ji bo tevgera 'Jon Tirk'an bnr: Durdu Mehmet Burak (2003)"Osmanlı Devleti'nde Jön Türk Hareketinin Başlaması ve Etkileri" OTAM (Ankara Üniversitesi Osmanlı Tarihi Araştırma ve Uygulama Merkezi Dergisi), v.14, pp.291-318.

*me de hakimiyê li me dikin*. (...) Tirk û Xunkar çi nam û unwan bivên, bila bidin xwe; lakîn Xwedê Kurd ji xizmeta wan re xelq nekiriye. (...) Ev hal, ev cahilî êdî bes e; aqilêxwe bînin serê xwe. (...) [H]un hemî hev re 'istîqbalek qenc tehyie bikin, *hemî hev ra xwe ji binê zulma Tirka xelas bikin*.(...) Bi îzna Xwedê, wê hingê ez'ê Kurda ji xulamiya Romê [Osmanî-Tirk] xilas bikim..." (Kurdistan, hj.27, r. 1-4).[1]

Her çiqasî Evdirehman Bedirxan van nêrînên xwe li ser rojnameya *Kurdistan* binivîse jî ev fikir tê xuyakirin ku di nav kurdan de zêde belav nebû ye. Ji ber ku di destpêka sedsala 20mîn de entelîjensiya kurd di nav Ittîhad-Terakkî de cih digirin û bi van re li dijî Siltan Evdilhemîd bi 'Jon Tirk'an re tevdigerin. Her çiqasî kurd, kurdayetî wek xalên girîng di nav û nivîsên komele û rojnameyên kurdan de derkevin pêş jî, fikra sereke ya van komelayan dîsa li ser fikra 'osmanî' bû. Hedef û armancên wan careke din ne zelal bûn û nakokiyên di navbera wan de her dewam dikirin.

Ev nakokiyên di navbera paşa û umerayên kurdan rê dide Cemiyeta Yekîtî û Pêşketinê (İTC) ku sazî û partiyên kurdan bigire. Zinar Silopî (Ekrem Cemilpaşa) di bîranînên xwe de dibeje ku di nav tevliheviyên ku Stenbol û welatê Osmanî tê re derbas dibûn de, umera û paşayên kurdan ku maeş ji hikumate Osmanî verdigirtin nizanibûn bê çi bikin. Lê, ligel ku ji ber berjewendiyên xweyî şexsî mixalifên hevdu bûn jî, piştî îlana azadiyê (hurriyet) ya di sala 1908an de, bi hevdu re bi navê Komeleya Teraqî û Teavûn vekirin. Lêbelê careke din berjewendiyên wanî şexsî ket ber berjewendiyên 'netewî' û ev komela hat girtin. Zinar Silopî (1969:23) vê yekê weha tîne ziman;

> Mixabin ev cemiyet [komele] zêde dewam nekir, dijrabertiya umera û paşayan hişt ku yekîtîparêzan (Îttîhadî) wan bi hesanî ji hev belav bike. Nelihevhatina Seyîd Ebdilqadirê merhûm ku xwe wek bavê manewî yên kurdistan û serokê şêxên terîqatan didît û Bedirxaniyan ev yek bi dawî bû.

Ev yek dê di avakirina *Komeleya Tealî ya Kurdîstan*ê de jî careke din derkeve meydanê. Ev yek dide xuya kirin ku her çiqasî di nav entelejiyansiya kurdan de fikra 'kurdbûn'ê hebe jî, niqaşa sereke ew e ku gelo ev çiqasî 'netewî' bû. Yanî di serî de dikare bê gotin ku di nav siyasetmedarên kurdan û entelijansiya kurdan ya wê demê de fikreke 'netewî' wek ya yewnanan, sirban, bulgaran xuya nake û nasnameya 'osmanî' û 'îslamî' pêşdetir e. Bêguman ji vê yekê mirov dikare bibêje ku di nav gel de ev yek bêhtir bû ji gotinên Seîdê Kurdî jî mirov vê yekê dikare derbixe. Seîdê Kurdî li gundên Kurdistanê digere û pirsên wan dibersivîne. Pirsên ku jê tên kirin bêhtir li ser 'îslamê' ne (Seîdê Nursî 2013:75-143).[2]

Bêguman ev yek di wê rewşê de tiştekî asayî dikare bê nirxandin. Ji ber ku Dewleta Osmanî ligel hemû tevliheviyan hîna jî wek dewlet li ser xwe bû û hîna fikra 'tirkbûn'ê zêde belav nebû bû. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bibêje ku di cografyaya kurdan de di nav gelê kurd de hişmendiyek 'netewî' belav ne buye. Ev 'texayyûl'a ku Anderson behs dike, di nav kurdan de wê demê bêhtir wek 'tehayyûlek' 'eşîrî' ye, an jî girêdana bi terîqat û şêxan e.

Di salê 1912an de fikra 'netewetî' û ya 'tirkbûn'ê di nav entelijansiya tirkan de belav bû. Ziya Gökalp, Yusuf Akçura, Fuad Köprülü ew rewşenbîrên tirk bûn ku ev fikir diparastin û belav dikirin. Ev yek bandor li entellejinsiya ya kurdan jî kir û komeleyên wek *Hêvî* hatin damezrandin, kovarên wek *Rojî Kurd* hatin weşandin; di van komele û kovaran de li ser kurdan, çanda wan nivîs, gotar dihatin weşandin. Lê gelek ji entelelijensiya kurdan ya li Stenbolê wek fermanber di nav Dewleta Osmanî de kar dikirin û an jî têkiliyên wan bi hevdu re hebun. Ji ber vê yekê jî bi destpêka şerê

1 Binê wan rêzan ji aliyê min hatiye xêzkirin.
2 Her weha piştre jî dê Seîdê Kurdî bibêje ku tirkan şûrê îslamê rakirine û gerek kurd li himberî wan dernekevin.

cîhanê yê yekemîn ev tevde ji bo şer hatin xwestin û ew jî çûn çeperê şer li ser navê Dewleta Osmanî. Ji ber vê yekê jî komele, dezgeh û saziyên kurdan hatin girtin û weşanên wan jî hatin betalkirin.

Li gorî ku Jwaideh (2004:226) dibêje, Rûsan gelek hewl dane ku kurd ligel wan li himberî tirkan şer bikin, le ligel hemû hewldanan, di şerê cîhanê yê yekemîn de kurdan li aliyê tirkan bi rûsan re şer kirine û sedemeke vê yekê jî 'propgandayên pan-îslamîst û banga cîhad'ê bûye. Di vê pêvajoyê de gelê ermenî jî ji bo mafê xwe bi piştgiriya rûsan tevdigerin. Di vî şerê di navbera Dewleta Rûs û Osamnî de ermenî aliyê Rusan, kurd jî bi piranî aliyê devleta Osmanî girtine. Di vê hevgirtinê de ji bo kurdan hestên olî pêşdetir in. Bi piranî jî şêx û oldarên Kurdan bi mûrîd û havalbendên xwe ve piştgirî dane Devleta Osmanî û li rex wê şer kirine. Şêx Hezretê Norşînî, Şêx Selahaddînê Gaydayî, Şêx Abdulbakiyê Kufrewî û Bediuzzeman Saidê Kurdî hinek ji van şêx û oldarên kurdan in ku li rex Dewleta Osmanî de li himber Rusan şer kirine. Ligel ku hinek ji Bedirxaniyan bi Rusan re têkilî danîbin jî, piraniyê beg û şêxên kurdan rexê Dewleta Osmanî girtine (Sinan Hakan 2013:29).

Gava kurdan bi rêvebir, şêx û entelejensiya ya xwe di nav refê arteşa Osmanî de şer dikirin, li aliyê din di navbera hêzên xurt ên wê demê Fransa, Ingiltere û Rusya de hewldanên parvekirina axa Împeratoriya Osmanî dihat niqaşkirin. Peymana Sykes-Picot ev yek dida ber xwe. Li gor vê peymanê Rojhilata Navîn di nav van hêzên xurt de dihat parvekirin, her weha axa ku kurd li ser dijîn jî, bêhtir jî ji ber belavbûna kurdan û siyaseta wan, dîsa di nav van hêzan de mijara parvekirinê bû. Li gor vê peymanê rojavaya îro û parçeyek ji bakurê Kurdistanê diket bin desthilatdariya Frensî, başur diket bin kontrola Ingilîzan û bakurê Kurdistan jî ji xwe wek Ermenîstanê diket bin kontrola Rusan de.[1] Ji ber vê yekê İsmail Beşikçî dibêje ku 'Kurdistan koloniyeke navnetewî ye' (bnr. Beşikçi1990). Her çiqasî ev peyman piştî şoreşa Oktobirê, ji aliyê Rusya ve hatibe aşkerekirin jî di dawiya şer de bandor li parvekirina axa Kurdistanê jî kir.

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, ku êdî Dewleta Osmanî têk çû, kurdan li ser prensîbên Wilson careke din dest bi xebatên xwe yên ji bo bidestxistina mafê xwe kirin. Têkçûna Dewleta Osmanî, tehcîrkirina ermeniyan, weqetandina misilmanên ereb ji Dewleta Osmanî bandor li ser rewşenbîr û serokên kurdan jî kir. Hêvî û fikrên girêdayî 'jiyana di bin banê dewleta osmanî, bi nasnameya 'islamî' şikandin û rê li weşan û tevgerên nû vekir û êdî Kurdistan wek 'welat' ket rojeva kurdan de. *Komelaya Pêşketina Kurdistanê (Kürdistan Tealî Cemiyeti*) û rojnameya wê ya ne fermî *Jîn* di vî warî de bûn pêşengê neteweperweriya kurdan.

Ev yek di rupelên *Jîn*'ê de ji aliyê Ewdirehim Rehmî di nivîsa bi navê 'halê meyî hazir' de wiha tê bilêvkirin;

> Belê, em Kurd heta nuha me his nekir ji ber destê hukumeta Tirkan derkevin, yanî ji menzûma Osmanîyan derkevin. Nuha em temaşe dikin, Wîlson di'bêjit 'çi Tirk nebit nadine Osmanîyan'. Hal ew e ku cîyê me dibêjin'ê Kürdistan; xeyrê du-sê memûran, ew jî ji ber memûrîyetê hatine cî bûne, bil ji wana çu Tirk çunînin. Wekî Tirk çunînin, ma Ermenî, mixeyn? Hindî Ermenî ne, mîqdarê sedan pêncê me nînin. Mixeyn jî sedan du bi zor teşkil diket. Paşê hingê, ji xeyrê Kurdan çu millete dî çunînin. Wekî we ye, Kürdistan heqê Kurdan e, ji xeyrê Kurdan heqê kesê nîne (Kovara Jîn j.6, r.14-15).

---

1 http://www.jewishvirtuallibrary.org/jsource/History/sykes_pico.html 30.01.2016.
http://www.smithsonianmag.com/history/sykes-picot-agreement-180957217/?no-ist 30.01.2016
http://www.britannica.com/event/Sykes-Picot-Agreement 30.01.2016
Her weha ji bo hinek dokumentên derheqê Sykes-Picot de bnr. http://wwi.lib.byu.edu/index.php/Main_Page

Lê di vir de dîsa xuya dike kû ev fikra netewe û 'welat' li Stenbol, li nav 'arîstokrat'ên kurdan maye û li bajarên kurdan zêde belav ne buye. Cemîl Paşa dibêje ku gava ew gihaştin Diyarbekirê rewşa kurdan û nemaze ya Diyarbekirê ne li gorî ku hêvî dikirin bû.

> Her tişt serobino bû bû. Mistefa Kemal û yên derdora wî kesên zîrek, qûrnaz û cesûr bûn. Dizanîbun dê çawa bi hesanî Kurdê cahil, Kurdê ku hazire ji bo dînê xwe her tiştê xwe fida bike bi xapînîn (Cemil Paşa 1991: 56).

Di domahiyê de Cemil Paşa dibêje ku ew û hevalên wî yên kurdperwer li nav eşîran û li bajarên wek Wêranşehir, Savur, Farqîn, Hezro geriyana, lê propagandaya wan, telkîn û waizên wan 'diket guhekî û ji yên din derdiket'.

> Bandor li mêjiyên wan ne dikir. Ji ber ku miftî, şêx û meleyên ku Nihat Paşa bi pereyan girtibûn milet bijehrî kiribûn (Cemil Paşa 1991:57).

Ev tev de didin xuyakirin ku di eniya şer de kurd hebun, lê li ser maseya lihevhatin û maf parvekirinê de tune bûn. Ev jî ji berbelavbûna wan, ji bêhedefbûna wan û bêsiyaseta wan wek encam derdiket holê. Fermandarê ingilîz Noel dibêje ku di nav şer de her çiqasî nêrînên serokên eşîrên kurdan guherî be jî dîsa, *di nav Kurdan de kêmasiya hevşibîniyan an jî nebûna hedefên hevpar, di nav wan de li himber rêveberiyê rê li ber yekitiyek netewî girti* bû (Noel 2010; 51, veg.Canlı&Uçak 150).

Ji wî wextî heta îro Kurd ji bo ku mafê xweyî 'netewî' bi destbixin şer dikin, tekoşînê dimeşînin. Li her çar parçeyên Kurdistanê tevgerên siyasî û leşkerî meşandine, îro jî hîna dimeşînin, lê hîna jî bandora encama şerê cîhanê yê yekemîn li ser civaka kurdan xuya dike. Kurd bi piranî di nav çar dewletan de, bêhtir jî ji aliyê çandî û her weha siyasî ve ji hev dû bi dûr ketin e.

**Rewşa Kurdan ya îro:**

Wek di serî de jî hat gotin rewşa kurdan ya îro bi gelemperî girêdayî hevgirtin û hewildanên wan an jî *xeleti*yên wan ên sed sal berê ne. Sed sal berê, gava Frensî, Ingilîz û Rus li ser peymana Sykes-Picot ya weşartî li hev hatin, kurd ji hev belabuyî bûn. Wek tê zanîn ev peymana veşartî piştî Şoreşa Oktobirê ji aliyê rêvebirên Rusya yên nû ve hat aşkerekirin. Herçiqasî hatibe aşkerekirin jî di encama şerê yekemîn de tê dîtin ku ev peyman bi awayekî pêk hatiye. Li jor bi kurtasî be jî amaje bi rewşa kurdan ya wê demê hat kirin. Wek li jor jî hat gotin, kurd ne xwedî yek siyaset bûn û ji aliyê fikrên 'neteweperwerî' ve ne jî 'pêşketî' bûn. Bi piranî li ser navê 'îslam' û 'osmanî' şer kirin, an jî bê serokên eşîrên wan berê wan da ku de rê bi wir de çûn. Yanî ji bo kurdên wê demê wek 'texayyûlek cemaatî' (an imagined community) ku kurd xwe bi kurdê dîn re wek endamê heman 'cemaatê' his bike tune bû. Gelo îro ev 'hissiyata cemaatî' an jî 'netewî' bi kurdan re heye? Piştî sed salan û piştî gelek serhildan, berxwedan, kuştin û qetlîaman kurd îro gihaştine kijan astê ji aliyên netewebûn û hestên netewî ve?

Kurd wek encameke şerê cîhanê yê 1mîn îro di nav çar dewletan de jiyana xwe didomînin. Dîsa wek encameke vî şerî û -peymana Sykes-Picot- ji aliyê çandî ve jî ji hev bi dûr ketine. Yên ku li Tirkiyeyê dijîn bêhtir bi çanda tirkî û ewropayî ve çûne -piranî jî van demê nêzîk 30-40 belkî jî 50 sal-, yên Îranê ber bi çand û zimanê farisan, û yên Iraq û Suriyeyê jî ber bi çand û zimanê ereban ve çûne. Ligel ku bingeha çandî, civakî ev e, gelo rewşa *saziyên jorîn* an jî siyaset çawa ye?

Ev yek ji aliyê siyaseta kurdan ya giştî û ya heremî dikare bê nirxandin. Îro gava behsa siyaseta kurdan tê kirin du siyasetên bingehîn ku bandorê li serdora xwe dikin/kirin e derdikevin pêşiya me. Ya li Bakur û ya li Başur. Her çiqasî ev siyaset di nava xwe de ne homojen bin jî gava li bandora

wan ya li ser parçeyên din tê nêrîn wek siyasetên bingehîn derdikevin meydanê. Ji ber vê yekê jî pêşî divê siyaseta bakur û başur hinekî bê analîzkirin.

**PKK û Siyaseta Bakur:**

Siyaseta kurdên bakur piştî avakirina netewe-dewleta Komara Tirkiyê, pêşî di sala 1925an di serhildana Şêx Seîd, piştre di sala 1930an di serhildana Agirî, û dawî jî di 'serhildan'a Dersîmê ya di salên 1937-38an de rubiruyê qetlîaman hat û têk çû. Heta salên 1960î jî bêdengiyek di nav siyaseta kurdên Tirkiyeyê de hebû. Bi da'weya 49an û darbeya 1960î ku ji aliyekî ve riya hinek derfetên xweîfadekirinê derxistin ve hêdî hêdî rewşenbîrên kurdan jî di nav siyasetê de careke din dengê xwe derxistin. Kurdan di serê pêşî de piranî di nav Partiya Karkeran ya Tirkiyê de cih girtin û dûv re jî bi demê re partî û saziyên xwe yên wek PDK-T (Partiya Demokrat a Kurdistan a Tirkiyeyê) û DDKO avakirin. Piştî 1970î jî komela, partî û weşanên kurdan zêde bûn ku gelek ji wan çepgir bûn.[1]

Darbeya 12ê Îlonê ya sala 1980î bandoreke gelek mezin li komele, dezgeh û partiyên kurdan kir. Ji aliyekî ve zext û zora dewletê, ji aliyekî ve keft û lefta civakî û siyasî, û ji aliyê din ve berberiya di nav rêxistinên kurdan bandor li ser rêxistin û siyaseta kurdan kir û ew belav kirin. Lê ji nav van rêxistinan de Partiya Karkerên Kurdistan ku di sala 1978an de hatibû damezrandin derket pêş û siyaseta bakûr domîne kir.

Li bakûr an jî Kurdistana Tirkiyeyê siyaseta herî bi bandor ji 1980î û vir de siyaseta PKKê ye. Wek tê zanîn PKKê di dawiya salên heftêyî de bi daxwaza 'Kurdistanek serbixwe, demokratîk û yekbuyî' derketibû qada siyasetê. Piştî darbeya leşkerî ya 12ê îlonê gelek endamên wê jî hatin girtin û yên ku man bi awayekî bi serokatiya Abdullah Öcalan û têkiliyên wî derketin derveyî welat û li wir dest bi xebatên xwe yên siyasî kirin. Rêxistin di sala 1984an de jî dest bi tekoşîna çekdarî dike. Her çiqasî hedefa wan 'Kurdistanek serbixwe, yekbuyî' be jî bêhtir raman û bala wan li ser 'bakur'ê Kurdistanê bû ku têkildarî damezirenerên rêxistinê xuya dike. Kesên ku îro hîna jî di nav rêveberiyê de cih digirin hîna jî ji wî wextî mane ku gelek ji wan di nav çepê tirkî derketibûn, an jî bi wan re di têkiliyekê de bûn, di zanîngehên Tirkiyeyê xwendibûn an jî dixwendin gava ku rêxistin ava kirin. Belkî jî ji ber vê yekê bala rêxistinê bêhtir li ser têkilî û hevkariya bi çepê tirkî re bû.

Rêxistin bi demê re di nav gel de bi rêxistin bû, belav bû, bi salên 90î re bû tevgereke girseyî û bi salên 2000î ve jî êdî hem ji aliyê legal û hem jî ji aliyê dijlegal ev girsebûna xwe zêdetir û berfirehtir kir.

Vê pevajoyê ji aliyekî ve di nav kurdên Tirkiyeyê de hişmendiyeke netewî û hestên netewî xurt kir û ji aliyê din ve jî wek encameke dijber ya vî şerî kurdên Tirkiyeyê bêhtir nêzîkî pergalê kir, kurd ketin nav pergala Tirkiyeyê. Ji aliyekî din ve siyaseta PKKê li dijî siyaseta 'başur', ligel hişmendiyeke 'neteweperwer', di nav kurdên parçeyên din de 'durbûn'ek jî ava kir.

Îro 'siyaset'a kurdên bakur bi kurtasî dikare bi vî şiklî bê gotin: di nav *Tirkiyeyê de xweseriya demokratîk*. Ji aliyê din ve heman siyaset vê yekê ji bo kurdên li welatê din jî wek çareseriyek dibîne û diparêze. Bingeha vê nêrînê jî piştî girtina Serokê PKKê Abdullah Ocalan û dîsa ji aliyê wî bi xwe ve hat avakirin.[2] Êdî PKK dev ji fikrên xwe yên 'Kurdistanek serbixwe û yekbuyî' berda û di nav Tirkiyeyê de li çareseriyekê geriya. Ev fikra 'xweseriya demokratîk' jî wek encama vê 'lêgerîn'ê derket meydanê.

---

1 Ji bo xebatek derbarê çepê kurdan ji 60î hta 2000a bnr. Emir Ali Türkmen- Abdurrahim Özmen (2013). Kürdistan Sosyalist Solu Kitabı.

2 Di hemû analîz, nivîs û gotinên nunerên vê siyasetê de ev yek dikare were dîtin. Lê ji bo pênase û xalên vê yekê bnr. Abdullah Ocalan (2012).Kürdistan Devrim Manifestosu, Kürt Sorunu ve Demokratik Ulus Çözümü.

Bihara ereban ku 2011an gihaşt Suriyê û hewldanên kurdên li Surî bandor li ser siyaseta kurdên bakur jî kir. Gerek destpêkirina pêvajoya 'çareseriyê', gerek 'têkçûn'a wê, kolana xendekan, îlankirina ‘xweseriya demokratîk’ û şerê ku di nav bajaran de rû dide hemû girêdayî rewşa 'Rojava' ne. 'Xweseriya demokratîk' ku ji aliyê nûnerên siyaseta kurdên bakur tê parastin jî îlhama xwe ji 'kanton'ên Rojava digire, û dîsa kantonên Rojava jî xuya ye li ser bingeha vê ‘xweseriya demokratîk’ ava bûne. Ev yek di civîna Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) ya di 14-15ê mijdarê de careke din bi rayagiştî ve hat parvekirin.[1]

**Başur an jî Herêma Kurdistan:**

Başurê Kurdistan di encama şerê cîhanê de wek ku Fransa û Ingilîzan li ser lihev kiribûn di bin destê Ingilîzan de ma. Di vê demê de Şêx Mehmûd Berzencî li himber rêveberiya Ingilîzan serî hildide û di encamê de tê girtîn û bi Hindistanê tê sirgûnkirin. Piştî ku dewleta Iraqê ji hêla Winston Churchil di sala 1921an de bi hevgirêdana Musil, Beğdad û Basra tê damezrandin gengeşî bi Tirkiyê re li ser Musilê derdikeve (Bruinessen 1991:149). Rêvebirên Ingilîzan ji bo ku balansekê çêbikin rê li vegera Şêx Mehmûd divekin. Şêx Mehmûd ji Hindistanê tê û Silêmaniyê bi cih dibe, li vir desteya wezîrê xwe kom dike, ser navê xwe pulan çap dike, rojnameya bi navê *Rojî Kurdistan* diweşîne. Di demeke nêzîk de bi Ingilîzan re dîsa dikeve nava şer û di encamê de di sala 1927an de tê girtin û vê carê bi Bexdad tê sirgûnkirin. Di sala 1956an de li wir jiyana xwe ji dest dide (Bruniessen 1991; Jwaideh 2004). Li gorî Barth (2001:79-86) Şêx kesekî xwedî 'qarîzma' ye.

Di 1932an de Iraq dibe dewleteke 'serbixwe', lê gava ku kurd serhildaneke din ji herema Barzan dest pê dikin dîsa Ingilîz bi hêzên asmanî yê qralîyetê alikarîya dewleta Iraqê dikin û bi alîkariya wan jî ev serhildan têk diçe, Şêx Ehmed Barzanî û birayê wî Mele Mistefa Barzanî bo Silêmanî tên sirgûnkirin. Revîna Mele Mistefa ji sirgûnê û hatina wî ya Barzan di sala 1943an, di tekoşîna kurdên başûr û her weha di tevgera azadiya kurdan tev de de xaleke nû dide destpêkirin. Di vê demê de tevgerên din yên kurdan hene ku yek ji wan jî partiya *Hîva* ye ku di 1935an de hatiye damezrandin. Li gor Jwaideh (2004:464-468) rola *Hîva* di serhildana Mele Mistefa Barzanî ya di navbera salên 1943-45an de gelek e. Di sala 1946an de jî sê partî, *Hêvî*, *Rizgarî* û *Şoreş* dibin yek û *Partiya Demokrata Kurd* (PDK) didamezrînin. Partî navê PDK ya ku li Mehabadê hatibû damezrandin distîne û serokê wê jî dikin Mele Mistefa Barzanî (Bilgin 1992: 84). Piştî têkçûna Komara Mehabad Mele Mistefa Barzanî divegere herêma Barzan, lê li vir jî nikare bimîne û dikeve 'meşa dirêj' ber bi Yekîtiya Sowyetan ku li wir 11 salên xwe derbas dike û di sala 1958an de ji aliyê Abdulkerîm Qasim tê dawetkirin û divegerê Bexdadê. Ev têkiliyên erênî zêde dewam nakin careke din di navbera kurdan û dewleta Iraqê de şer derdikeve. Geh bi şer û geh bi hevdîtinan ev pêvajo heta 1975an dewam dike û di wê salê de kurd rastî têkçûneke dijwar tên. Di encama vê têkçûnê de tevgera kurdan ya başûr dibe du parçe ku bandora xwe heta îro jî didomîne. Li aliyekî PDK ku bêhtir li herema Bahdînan bihêz e û li aliyê di YNK (Yekîtî) ku bêhtir li herema Soran bihêz e. Ev 'dûalîtî' hem di şerê Iraq û Îranê ye di navbera 1980-88an de, hem di pêvajoya piştî 'şerê kendavê' de û hem îro jî dewam dike.[2]

Mûdaxaleya navnetewî ya 2003an derfetên nû ji bo kurdan bi xwe re anîn û piştî niqaşên dûr û dirêj di sala 2006an de PDK û YNK lihevhatin û Rêveberiya Heremî Ya Kurdistan (KRG-Kurdistan Regional Goverment) damezrandin (Rogg & Rimscha 2007:832) ku îro jî di nav niqaşên navxweyî

1http://ozgur-gundem.org/haber/149657/demokratik-ozerlik-ve-ozyonetim-bir-statu-talebidir. 16.11.2015

2 Ev 'dûalîtî' di navbera salên 1994-98an gihişt asta şerê 'navxweyî' û bi hezaran kes ji her dû aliyan jiyana xwe ji dest da (Inga Rogg and Hans Rimscha 2007:829).

û daxwaza 'serxwebûn'ê de birêve diçe. Li vir wek diyardeyek civakî dikare bê gotin ku her pêşveçûnek ji bo kurdan li parçeyekî, bandorê li kurdên din jî dike. Wek tê zanîn Komara Mehabad û damezrandina PDK bandor li ser kurdên din jî kir û di encamê de PDK-Iraq hat damezrandin. Vegera Mele Mistefa Barzanî û tevgera kurdên başur di wan salan de bandor li kurdên Sûrî û Tirkiyeyê jî kir ku di encamê de PDK-Sûrî û PDK-Tirkiyeyê hat damezrandin. Herweha, avakirina Herêma Kurdistan ji aliyekî ve hêviyên kurdan ji bo azadî, mafê çarenûsê û bidestxistina statuyekê bilind kirin û bi vî awayî di nav gelên kurd de hestên 'netewî' jî berfirehtir kirin. Lê ji aliyê din ve niqaşên di navbera siyaset û partiyên kurdan de ev hestên 'netewî' û têgihiştina 'netewebûn'a kurdan teng dike. Ev yek jî ji têkilî û niqaşên di navbera siyaset û partiyên kurdan pêk tê. Rewşa kurdên rojava jî ji gelek aliyan ve têkildarî siyasetên kurdên bakur û başûr û nêrînên wan ên cuda ye.

**PYD/YPG û Rojava:**

Têkiliyeke xurt û nêzîk di navbera siyaseta kurdên Rojava û partiyên wan û kurdên bakur û başur de heye. Tevgerên van partiyan û siyaseta wan û her weha helwesta wan partiyan li himberî Rojava bandorê hem li kurdên rojava û hem jî li kurdan tevde dike.

Frensa piştî şerê cîhanê yê yekemîn, wek di peymana Sykes-Picot de bi ingilîzan re lihevkiribûn, 'binê xetê' yanî 'Surî'ya îro xiste bin destê xwe û li wê derê hukumeteke mêtinger ava kir. Bi vê yekê re 'Rojava' jî di nav dewleta 'Surî' de hat qebulkirin. Temo (2012:39) vê yekê bi rengî tîne ziman;

> Piştî Peymana Saykes-Pikot û projeya parçekirina paşmayên Osmaniyan ku di navbera Ingilîz û Fransa û Rûsan de çêbû û Kurdistan bi vê encamê bû çar parçe û bi encama peymana San Rimo ya ku di 19-26 Avrêla sala 1920an de pêkhatî de; Cizîra Kurdî tevlî Sûryê bû û ciyên dî jî di sala 1921an de tevlî bûn. Û goriya vê yekê jî sînorê navbera Sûryê û Tirkiyê hate danîn. Ev peyman di navbera dewleta Fransa û Tirkiyê de, di 09.03.1921an de, li Londonê hate mohrkirin.

Sînorê Sûrî û Tirkiyeyê halê xwe yê dawî di sala 1939an de sitand û bi vê yekê jî parçebûna kurdan hat mohrkirin. Di sala 1946an de Sûrî wek dewletek serbixwe di nav Yekîtiya Neteweyan de hat qebûlkirin. Ji vê demê heta sala 1970yî rêveberiya Sûrî bi darbeyên leşkerî gelek caran hat guhertin. Hafiz Esed di sala 1970yî de bi darbeyek leşkerî rêveberî bi dest xist û ev rêveberî heta îro jî bi riya kurê wî Beşar Esed dewam dike (Yazıcı 2012; Bedreddîn 2014).[1]

Her çiqasî piştî şerê cîhanê 'sînor' hatibin danîn jî têkiliya kurdên bakur û rojava dewam kiriye. Rojava, ji bo kurdên bakur ji aliyekî ve buye cihekî sitarê û ji aliyên din ve jî wek mînaka *Xoybûn* buye baregaha tevgerên siyasî yên ku li nav kurdên Tirkiyeyê xebatê dikin. Kesên ku ji serhildan û berxwedan û sirgûnên li Tirkiyeyê direvîn,[2] xwe li Surî ya ku di bin desthilatdariya Frensayê de bû girtin. Di wê demê de ne tenê ji aliyê siyasî lê belê ji aliyê xebatên çand û ziman ve jî Surî cihekî girîng bu ji bo kurdan.

Lê piştî ku frensî çûn û dewleta Surî ya ereban hat avakirin rewşa kurdên li Surî jî hat guhertin. Heman politikayên ku li Iraq, Îran û Tirkiyeyê hatibûn li darxistin li surî jî hatin meşandin. Ev politika jî, ji aliyekî ve sirgûn, ji aliyê din ve înkarkirin û asimilasyon bûn. Her weha tevgerên kurdan ku di dema frensiyan de dest pe kiribûn, piştî serxwebûna dewleta Sûrî li himber hişmendiya 'erebî' jî dewam kirin. Pêkhatinên li başûr an jî Kurdistana Iraqê bandor li rewşenbîr û

1 Agahiyên derbarê Dîroka Sûrî ji vê derê jî dikarin werin wergirtin: http://countrystudies.us/syria/ 08.02.2016
2 Ev buyer bi kurtî ev in: 1925 -Serhildana Şêx Seîd; 1928-Tevgera Haco; 1930-Serhildana Agirî; 1937-38-Buyerên Dersîmê.

siyasetmedarên kurdan jî kir û di sala 1957an de rê li damezrandina *Partiya Demokratîk ya Kurdistan ya Sûriyê* vekir.

Partiya Baas'ê ku di sala 1963an de bi darbeyeke leşkerî desthilatdarî bidest xist, li himberî kurdan politikayeke tundrew meşend ku di domahiya salan de bi projeya çêkirina 'kembera erebî' bi encam bû.

> Ev proje li seranserî sînorê Tirkiyê Tirkyayê û hinek jî ber bi sînorê Iraqê ve di nav dirêjiya 375 km û pahnbûna 10-15 km an de pêk hat. Ji Dêrikê destpê dikir û heta bi bajarê Serê Kaniyê didomiya (Temo 2012:66).

Di çarçoveya vê projeyê de li cihê kurdan ereb dihatin bicihkirin, gundên nû dihatin avakirin û navê gundên kurdan dihatin guhartin. Ji aliyekî ve qutkirina têkiliya kurdên bakur û rojava û ji aliyên din ve asîmîlasyona kurdan armancên bingehîn yê vê projeyê bûn. Ji ber van polîtikayên Baasê nifusa kurdên Sûrî nayê zanîn bê çiqas e, lê gor texmînan di navbera % 9-15an de ye ku ew jî dike 1.800.000 û 3.000.000 kes. Dîsa li gor texmînan kurdên bênasname ku piraniya wan kesên ji bakur koç kirine ne pêk tên jî 300.000 kes in (Bedreddîn 2014:29).[1]

Rewş û siyaseta kurdên Sûrî piştî salên 2000î hat guhertin. Wek tê zanîn di dawiya sala 1998an de serokê PKKê Abdullah Ocalan bi zextên Tirkiyê û hêzên navdewletî mecbûr ma ji Sûrî derbikeve û piştî rêvîtiya çar mehan di 15ê Sibata 1999an de bi operasyoneke navnetewî li Kenyayê hat girtin û teslîmî Tirkiyê hat kirin. Vê yekê her weha têkiliya PKK û dewleta Sûrî jî hinekî sist kir ku ev yek di damezirandina PYD (Partiya Yekîtiya Demokratîk) jî dikare bê dîtin. Ji bilî vê yekê, mirina Hafız Esed, mûdexaleya li Iraqê ya hêzên navdewletî, ketina Seddam Huseyin û avabûna 'Hêrema Kurdistan' bandor li Kurdên Sûrî jî kir. Buyerên Qamişlo yên di sala 2004an de di vê çarçoveyê de dikarin bên nirxandin. 12ê Adara sala 2004an di lîstîka gogê ya di navbera tîma Deyr-El Zor û tîma Qamişlo El-Cîhad de, alîgirên tîma Deyr-El Zor êrîşî alîgirên tîma El-Cihad dike û piştî vê yekê leşkerî Sûrî jî tevlî buyeran dibin û di encamê de 7 kurd jiyana xwe ji dest didin. Piştî van buyeran li gelek deverên din wek, Amudê, Dêrik, Hesekê, Serê Kaniyê û Şamê jî xwepêşandan çêdibin. Di encama van buyeran de jî kuştin çêdibe û hinek jî birîndar dibin (Schmidinger 2015: 92-98). Bi van êrîşan rejîma Sûrî dixwest ku tevgera kurdan berî ku geştir bibe bifetisîne, lê xwepêşandanên girseyî yên Sûrî, tekoşîna kurdan û dewleta Sûrî dewam kir. Piştî şerê navxweyî kurdan ji derfetên ku derketin meydanê îstîfade kirin û di 19-24ê Tirmeha 2012an de bi pêşengiya PYDê û baskê wê çekdarî YPG/YPJ li Cizîr, Kobanî û Efrînê desthilatdarî bi dest xistin ku ev yek ji aliyê rêxistinên din ên kurdan ve wek 'hevkariya bi rejîma Sûrî' re hat nirxandin. Schmidinger (2015:114) dibêje ku her dû alî jî tiştên dijberî hev dibêjin û ev yek jî hêla dîroknasan ve dê bê zelalkirin û weha didomîne;

> Rastî ew e ku rejîmê, di navbera 19-24ê Tirmeha 2012an de beşeke mezin ya Rojava Cizîr, Efrîn û Kobanî jî di nav de- heme heme bêyî şer- teslîmî hêzên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) ku ji aliyê PYDê ve hatibûn damezrandin kir û arteşa Sûrî gelek ji cebilxane û techîzatên xwe li pey xwe hiştin û vekişiya.

Di 2013an de 'peymana civakî' (makezagona kantonên Rojava) hat amadekirin û di destpêka sala 2014an de jî pêşî li Cizîrê û dûv re li Kobanê û Efrînê 'kanton' hatin îlankirin. Ligel vê yekê ji 2012an heta îro di siyaseta kurdên rojava de du alî hene. Yek ji wan TEV-DEM (Tevgera Civaka Demokratîk) ku PYD jî di nav de ye û yan din jî ENKS (Encumena Niştimanî ya Kurdî ya Sûriyê)

1 http://countrystudies.us/syria/23.htm 08.02.2016

ye ku PDK-S di nav de cih digire. Ligel ku TEV-DEM nêzîkî PKKê ye û li ser fikrên Abdullah Ocalan yên 'xweseriya demokratîk' an jî 'konfederalîzma demokratîk' dimeşe, ENKS nêzîkî Herêma Kurdistan û PDKê ye.[1] Ev yek careke din berê me dide niqaşa 'netewebûn' û fikra 'netewetî' ya kurdan.

**Kurd, Netewebûn û Siyaset:**

Kurd bi hejmara xweyî 40 milyonan gelekî niştecihê Rojhilata Navîn e ku heta îro jî mafê xweyî çarenûsî bi dest nexistiye (bo infuse bnr. https://www.institutkurde.org/en/info/the-kurdish-population-1232551004). Bêguman gelek sedemên vê yekê hene, lê yek ji wan jî girêdayî 'netewebûn'a kurdan e. Ji ber vê yekê jî pêwiste bi kurtasî li ser netewe, netewebûn, netewîtiyê bê rawestin.

**Netewe, neteweperwerî:**

Netewe, neteweperwerî, netewebûn îro hîna jî mijarên balkêş û sereke ne di nav civaka zanistî de û her weha di jiyana rojane de jî dîsa mijarên sereke ne. Gava ku behsa netweperweriyek tê kirin bêguman di nav de avakirina dewletekê jî an jî bi gotineke din 'netewe-dewlet' jî tê niqaşkirin.

Li ser pênaseya 'netewe', 'neteweperwerî', derketina vê diyardeya (fenomen) civakî û belavbûna wê heta îro gelek kes xebitîne, gelek tişt hatine gotin. Di nav wan de nêrîna hevpar ew e ku ev diyardeya civakî bi derketina sermayedariyê (kapîtalîzm) ve girêdayî ye.[2] Wek ku Hobsbawm (1992:29) jî dibêje. *"Taybetmendiya neteweya modern û her tiştên pê ve girêdayî, modernbûna wê ye"*. Fikra netewe ku bi modernîteyê ve derdikevê her diçe belav dibê û bandorê li derdora xwe dike. Ji wê demê û vir de netewe, "*wek birêxistinbûnek civakî û siyasî ji wexta ku derketiyê holê û vir de ji kes û jiyana mirov hêjatir e*" (Özkırımlı 2009:12).

Tiştên ji jiyana mirov hêjatir û mirov ji bo wê canê xwe jî dide gelek caran 'ax'a ku li ser dijî ye ku ev dibê bingeha 'neteweperwerî'yê. Bi gotina Özoğlu (2009:33);

> Neteweperwerî wek pêvajoyeke siyasî ku armanca wê ji bo kesên li ser welatekî dîrokî xweseriyê dixwazin hişmendiyek komî ava bike ye.

Hişmendiya komî ev tiştê ku Anderson wek 'cemaate taxayyûlî' binav dikê. Li gor Anderson (2004:20);

> Netewe, civakeke siyasî ya texayyulî ye (...), ji ber ku, endamên neteweyek herî biçuk jî dê yên din nasnekin, dê wan nebînin, di derbarê piraniyê wan de tiştekî nebihîzin, lê dîsa jî xeyala tevahiya wan dê di zihnê hemuyan de bijî.

Ev 'texayyulkirin' jî di nêrîna Anderson de bi pêvajoya sermayedariyê û berfirehbûn û belavbûna çapemeniyê ve girêdayî ye ku dîsa têkildarî sermaye û sermayedariyê ye. Çapemenî, bi gotina îro ragihandin û derfetên ragihandinê mirovên ku hev 'nasnakin' nêzîkî hev dike û dihele ku ew xwe wek 'cemaatekê' his bikin. Ev yek di rewşa kurdan ya îro de jî dikare bê ceribandin.

---

1 Ji bo nêrînek giştî derbarê Kurdên Sûrî de bnr: http://www.crisisgroup.org/~/media/Files/Middle%20East%20North%20Africa/Iraq%20Syria%20Lebanon/Syria/136-syrias-kurds-a-struggle-within-a-struggle.pdf 09.02.2016; Ji bo makezagona Kantonên Rojava bnr: Mutlu Civiroglu "The Constitution of Rojava Cantons", http://civiroglu.net/the-constitution-of-the-rojava-cantons/ 09.02.2016. Ji bo konfederalîzma Demokratîk' bnr. Abdullah Ocalan (2011). Democratic Confederalism; Her weha ji bo rexneyên derbarê PYDê jî bnr: Seîd Weroj

2 Ev yek di xebatên sereke yên li ser 'netewe', 'neteweperwerî'yê dikare were dîtin. Ji bo xebatek ku hemû teoriyên 'neteweperweriyê' di nav xwe de dihewîne bnr. Özkırımlı (2009).

**Netewebûn û siyaseta Kurdan:**

Wek li jor jî hat gotin kurd li ser politikayên hêzên mezin yên serê sedsala 20mîn ji hev veqetiyane û ev parçebûn hîna jî dewam dike. Ev parçebûn hem ji aliyê sînorên fermî û hem jî ji aliyê çand, 'ziman' (alfabe) ve derdikevê meydanê. Ev yek wek biserketina polîtikayên sedsalî yên li himberî kurdan hatine meşandin jî dikare bê nirxandin. Ligel vê yekê wek 'herema Kurdistan' û 'kanton'ên rojava hinek destkeftiyên kurdan jî xuya dikin. Ev destkeftî dê çiqasî dewam bikin, an jî gava ku roj çû ava çiqas ji van destkeftiyan bimînin di destê kurdan de girêdayî siyaseta/siyasetên kurdan bi xwe ye.

Wekî din ji salên 1990î û vir de bi pêşveçûna tevgera kurdan di warê ragihandinê de jî pêşketin hene û îro ev yek ji aliyê teknolojiyê ve gihaştiya standartên navnetewî. Ligel pêşketinên ragihandinê, destkeftiyên wek 'herema Kurdistan' û 'kanton'an, û ligel parçebûna kurdan, gelo netewetî û hestên netewî di nav kurdan çawa ne? gelo Kurd xwe wek cemaatrkê texayyul dikin? di vê mijarê de sekna gel û siyaseta partiyên kurdan çiqasî nêzîkî hevdû ye?

Li vir li ser sê mînakan netewetiya kurdan û siyaset dê bê nirxandin. Yek jê 'kongreya netewî', û yên din jî buyerên Şingalê û Kobanê ne. Bêguman gelek mînakên din dikarin bên lêzêdekirin wek qîrkirina Helebçe ku di hafizeya kolektîf ya hemu kurdan de cihekî girîng digire, lê ji bo hişmendiya netewî ya kurdan û siyaseta partiyên kurdan ev her sê mînak dê ji bo nirxandineke îroyîn bes bin.

Di nav gengeşiya şerê navxweyî yê Sûrî de di havîna sala 2013an de nûnerên 39 kom û partiyên kurdan li Hewlêrê ji bo lidarxistina 'Kongreya Netewî' civiyan.[1] Vê geşedanê kelecan xist dilê hemû kurdan û hêviyên wan yê ji bo 'yekîtî'yê careke din geş kirin. Çend roj berî roja ku ji bo lidarxistina kongreyê hatibû diyarkirin lijneya amadekariyê daxuyaniyek da ku ji ber 'pirsgirêkên teknîkî' kongre hatiye bipaşxistin.

'Pirsgirêkên teknîkî' berjewendiyên siyasî yên hizb, kom, komele û partiyên kurdan bûn û ji ber vê yekê cara duyemîn ji bo çend rojan û cara sêyemîn jî kongre ji bo wextekî nediyar hat paşxistin (betalkirin).[2] Wan roja ji di derbarê paşxistin û bandora wê netewî de wiha hatibû nivîsîn;

> Berî her tiştî, lidarxistina kongreyek wiha ji bo kurdan tev de ‘sînor’ekî derûnî ye, ango psikolojîk e. ji ber ku, ev hêviya sed salî ye. Lidarxistina kongreyek neteweyî ruhekî din dide kurdan, kelecanek mezin di deruniya wan de çêdike, wan serbilind dike, û di nav vê tevlîheviya heremê de wan bi hêvî dike ji bo pêşereoja xwe. Bipaşxistin, tirsa nelidarxistinê dixe dilê mirov, wê kelecanê dikuje, hêviyan qut dike, dicemidîne. Pêşerojê tarî dike! (Keskin 2013).

Belkî pêşeroja kurdan tarî nekir, lê tiştekî din diyar kir ku di nav gel de çiqasî hişmendiya 'netewî' zêde bûbe jî, ji bo hizbên kurdan ya herî girîng parçeyê ku li ser tekoşînê didin e. Ev yek careke din di buyerên Şingal û Kobanî de jî derket derve.

Wek di serî de jî hinekî hat behskirin, ol (dîn) di nav civaka kurdan de diyardeyeke girîng e û cudatiyên olî an jî mezhebî jî gelek caran dikevin pêşiya nasnameya 'etnîkî' an jî 'netewî'. Ji ber vê yekê jî buyerên ku di serê Tebaxa 2014an de li Şingalê bûn ji bo civaka kurdan û ji bo têgihiştina nasnameya 'netewî' girîng in. Çi li başur, çi li bakur, çi jî li rojava xwedîderketina gelê kurd li

---

1 http://rudaw.net/english/kurdistan/23072013 23.12.2013

2 Ji bo nuçeyên wê demê yên derbarê kongre de bnr: http://krd.sputniknews.com/kurdish.ruvr.ru/news/2013_08_16/234742521/ http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/030920138 http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/1011201311 lênerîna dawî: 14.02.2016

cemaate kurdên Êzîdî ku ji ber êrîşên çekdarên 'dewleta îslamî' (piraniya wan li ser mezhebê sunnî diçûn/diçin) direvîn guhertina civaka kurdan jî derdixist holê. Ligel dijîtî û cudahiyên olî, kurdên sunnî-şafîi ji ber 'kurdbûn'a êzîdiyan xwedî li wan derketin, nanê xwe bi wan re parvekirin ku ev yek bi gelemperî dikare di çarçoveya 'texayyûla cemaatî' de bê nirxandin. Ligel têgihiştina 'netewî' di nav gelê kurdên bakur, başur û rojava û ligel hevkariya peşmerge, yekîne û gerîla di qada jiyanê de, di qada siyasetê de dijberî û dijîtiya partî û siyaseta wan derdiket pêş û di medya ya ku her yek ji wan bi hizbekê ve girêdayî bû jî ev dijberî bi nuçe û şiroveyan di nav gel de belav dibû. Li aliyekî 'reva peşmerga ji Şingalê', li aliyê din jî 'hebûna gerîla' li Şingalê dihat nirxandin û ev yek bandor li ser gel bixwe jî dikir.[1] Wan rojan, ligel ku kurdên başur bi her tiştê xwe alikariya kurdên êzîdî dikirin, di nav kurdên bakur de gotegota ku 'başur alikariya kurdên êzîdî nake' belav dibû û ev ji hêla hinek nûnerên siyasî jî dihat bilêvkirin.[2] Dijberîtî û nakokiyên di nav siyaseta kurdan piştî 'rizgarkirin'a Şingalê jî dewam kir. Wek tê zanîn, Serokê Herema Kurdistanê Mesud Barzanî, di 13.11.2015an de li ser çiyayê Şingalê daxuyeniyek çapemeniyê da. Di vê daxuyayinê de Barzanî wiha digot;

> Li Şengalê, bi xwîna Pêşmerge destanek hate nivîsîn. Me soza ku dabû xwişk û birayên xwe yên ezdî bi cih anî. Li vê derê, ji ser Çiyayê Şengalê ez mizgîniya rizgarkirina Şengalê didim xwişk û birayên ezdî û hemû gelê Kurdistanê. Me tola xwe stend.[3]

Ligel daxuyanî û mizgîniya Serok Barzanî hîna jî ne diyar e bê 'kî' Şingal 'rizgar' kiriye. Ji ber ku li başur hîna jî du hêzên peşmerge hene û dîsa tê zanîn ku ji serê buyera Şingalê ve hêzên gerîlayê HPGê jî hene. Careke din di hevkariya di qadê dibê mijara niqaşên berjewendiyên siyasî. Wan rojan di bernameya televîzyona *Rudaw*ê de li ser mijara 'rizgarkirina Şingalê', berpirsên YNK li Şingalê û Qaymeqamê Şengalê Mahma Xelîl ku PDKyî ye nêrînên xwe parve kiri bûn. Pirsa sereke ya bernamê 'kî Şingal rizgar kir? 'bû?.[4] Ev niqaş careke din 'parçebûn'a kurdan ya zihnî, yanî ya di mêjî de didê xuyakirin.

Heman tişt di buyera Kobanî de jî dikare bê dîtin. Kobanî yek ji 'kanton'ên ku ji hêla PYDê ve di serê sala 2014an (27 Rebendan-Qanûna paşîn 2014) hatibû îlankirin (Schmidinger 2014:132). Piştî buyerên Şingalê, di îlona 2014an de çekdarên DAIŞê êrîşi Kobanî kirin û bi sedhezaran kes sînorê Tirkiyeyê derbaskirin. Di hûndirê bajêr de hêzên PYD/YPG û çekdarên DAIŞê qederê 5 mehan şer kirin û di dawiyê de hêzên kurdan (PYD/YPG) bi alikariya Hêzên Peşmerge ku ji Herema Kurdistan hatibûn şandin û hêzên asimanî yên navnetewî çekdarên DAIŞê ji bajêr derxistin û 26ê Rebendan a 2015an de Kobanî rizgar kirin.[5] Di vir de ya girîng, helwestên gel û hizbên kurdan li himber dorpêçkirin û berxwedana Kobanî ye. Her ku dorpêçkirina Kobanî dijwartir bû helwestên kurdan yên 'netewî' jî bihêztir dibûn ku wek nasnameya kurd ya 'dûrî sînoran' (transnatinoal idendity) jî dihat binavkirin.[6] Ligel bilindbûn û belavbûna hestên 'netewî' li nav kurdan, li dinyayê

1 Bi gelemperî rewşa medya ya kurdan û xususî jî berteka wan ya wan deman mijareke serbixwe ye û her weha ji aliyê 'netewebûn' û 'rola ragihandinê' de jî dikare were niqaşkirin.
2 Ligel vê yekê di wan rojan de şaredarên Duhokê tevî xebatkarên xwe 24 saetan alikarî didan kurdên êzîdî. Ji bo nêrîn û şirove bnr. http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/8/state8412.htm lênêrîna dawî: 14.02.2015
http://www.basnews.com/index.php/so/news/65020
3 http://www.rojevakurd.com/serok-barzani-mizginiya-azadkirina-singale-ragihand/ lênêrîna dawî: 14.02.2016
4 Ji bo niqaşên di bernamê de bnr. http://rudaw.net/kurmanci/onair/tv/episodes/episode/2ali_18112015 lênêrîna dawî: 14.02.2016
5 Ji bo kurte-dîroka 'dorpêça Kobanî' bnr. http://www.bbc.com/news/world-middle-east-29688108 lênerîna dawî: 14.02.2016
6 http://time.com/4003737/kobani-isis-photos/ lênêrîna dawî: 12.02.2016

tevde jî ji ber berxwedana hêzên YPG li himber DAIŞê hestiyariyek berfireh bilind dibû. Piştî van geşedanan û hewldanên Serokê Herema Kurdistanê Mesud Barzanî, hêzên navnetewî alîkariya asemanî dan berxwedêrên Kobanî û mehekê şûnde jî hêzên peşmerge bo Kobanî bi rê ketin. Çuyîna hêzên peşmerge bo Kobanî, riya ku tê re derbasbûn, helwesta gelê kurdên bakur li himber peşmergeyên ku ber bi Kobanî ve diçûn, ligel hemû dijberî û dijîtiya hizbên kurdan hestên 'netewî' yên gelê kurd nîşan dikirin. Ev ji aliyekî ve ligel hemû 'sînor'ên çêkirî yên bermayiyên peymana Sykes-Picot, wek hilweşandina heman peymanê[1] û sembola 'yekîtî' û hevkariya kurdan dihat nirxandin.[2] Di vê navberê de daxuyaniya polîtburoya YNK (Yekîtiya Niştimanên Kurdistan) ku tê de dihat gotin ku *'alikariya ji şervanên YPGê re hatiye şandin, bi destê YNK hatiye tomarkirin'*[3] careke din helwesta 'netewî' ya hizbên kurdan dida ber çavan, ji ber ku YNK li gel PDKê avakarê hikumeta Herêma Kurdistanê bû, lê ev alîkarî ne wek alikariya *Herêm*ê lê wek alikariya 'hizbî' dihat nirxandin.

**Encam:**

Gava şerê cîhanê yê yekemîn bi dawî bû, hevpeymanên navnetewî yên di navbera hêzên mezîn yên wê demê de birêve çûn. Hêzên mezin yên wê demê Frensa û Ingilîz bûn û her weha parçebûna Rojhilata Navîn jî li gor berjewendiyên wan pêk hatin. Kurd, her çiqasî di qada şer de hebûn jî, ji ber ku wek 'netewe' hewl nedidan û serok û rêberên wan wek 'yek alî' dest nedidan hev, ji maseya çareseriyê bi dûr ketin û di dawiyê de jî gelê kurd di nav sê[4] dewletên çêkirî de belav bûn. Piştî tekoşîna sedsalî vê çarenûsa xwe dikin biguherînin. Li aliyekî Herêma Kurdistan, li aliyekî 'Kantonên Rojava' û li aliyê din jî hinek destkeftiyên 'çandî' li Tirkiyeyê wek encamên vê tekoşîna sedsalî dikarin bên nirxandin.

Di nava vî sedsalî de parçebûna kurdan ya fizîkî bandor li ser 'çand' û rengê tevgerên wan jî kiriye. Her çiqasî geşedanên dinyayê û rojhilata navîn bandor li ser gelê kurd bike û wan ji aliyê hestî ve 'nêzîkî' hev bike jî, yanî hestên 'netewî' ku kurd li her çar parçeyî xwe di nav 'cemaatekê' de 'texayyul' bikin pêş de biçin jî, ji ber parçebûna zihnî û siyasetên 'cuda'; 'yekîtî' ya kurdan ji bo îro wek xeyalekî dûr xuya dike. Li aliyê din, di Rojhilata Navîn de 'netewebûn', an jî 'yekîtî' bi 'pêşeng'ên karîzmatîk ve girêdayî xuya dike û ji bo kurdan îro ji hindikayî ve 'du kes' bi vî rengî derdikevin pêş ku sembol, nêrîn û sirudên kurdan li gor wan tên guhertin. Ji aliyekî ve hestên 'netewî' bi buyerên wek Şingal û Kobanî 'sînor'ên çêkirî derbas dikin, ji aliyê din ev hest di nav van sînoran ji aliyê partî û saziyên kurdan careke din tên hilberîn. Dijberî, berberî û nakokiya di navbera partî û serokên kurdan van hestên netewî yên gelê kurd ber bi aliyekî ve dibe. Wek ku Schmidinger (2014:342) tîne ziman *'di dawî de ihtimaleke mezin ne yek lê se-çar Kurdistan dê derkevin meydanê'*. Krizên li Herêma Kurdistan (serokatî, aborî, referandûm, dijberiya Hewlêr û Silêmanî) bi serê xwe vê yekê nîşan dikin.

---

1 Hiwa Ali (2014). "Yes, the Peshmerga broken Sykes-Picot", http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/11/state8632.htm Lênêrîna dawî: 14.02.2016;

2 Isabel Coles (2014). " Kurds' battle for Syria's Kobani unites a people divided by borders", http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/10/syriakurd1629.htm lênêrîna dawî: 14.02.2016.
Necat Keskin (2014). " A Starting point towards ‘unification’ between Kurds: Peshmerga to Kobani", http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/10/syriakurd1628.htm lênêrîna dawî: 14.02.2016.

3 Ji bo daxuyaniyê bnr. http://www.pukmedia.com/EN/KK_Direje.aspx?Jimare=17283 lênêrîna dawî: 14.02.2016

4 Sedema sereke ya parçebûna kurdên Îranê ji kurdên din, her çiqasî bandora wê li ser hebe jî, ne şerê cîhanê yê yekemîn e. Ev yek bêhtir bi peymanên di navbera dewleta Osmanî û Dewleta Safewî ya Îranê ve girêdayî ye.

Wek encamp dikare bê gotin ku, îro wek sed sal berê careke din şer li ser axa ku kurd li ser dijîn dibe û kurd bi her awayî di nav vî şerî de ne. Ligel her alozî, nakokî, dijberî û dijîtiya nav xwe, eger siyaset, hizb û partiyên kurdan di vê gengeşiya Rojhilata Navîn ya îro de li himber nêrînên hev 'rêzdar' bin û bikaribin bi 'hevkarî' tevbigerin dê di maseya çareseriyê de jî wek ku di qada şer de ne bibin aktorekî sereke. Eger nikaribin vê yekê bikin û ne xwedî pêşbîniyeke kûr û berfireh bin *dê dîsa berê xwe bidin çiyayê bilind*.[1]

**Çavkanî:**


Akgün, Seçil (1991). "The Emergence of Tanzimat in the Ottoman Empire", OTAM (Ankara Üniversitesi Osmanlı Araştırmaları ve Uygulama Merkezi Dergisi), v.2, pp. 1-14. http://dergiler.ankara.edu.tr/detail.php?id=19&sayi_id=821

Alî, Hiwa (2014). "Yes, the Peshmerga broken Sykes-Picot", http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/11/state8632.htm Lênêrîna dawî: 14.02.2016.

Anderson, Benedict (2004). Hayali Cemaatler: Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması (3.bsk.), Istanbul: Metis

Aydin, Suavi (1992). Modernleşme ve Milliyetçilik, Ankara: Gündoğan

Beşikçi, İsmail (1990). Devletlerarası Sömürge Kürdistan, Institut Kurde de Paris: Paris.

Bilgin, M. Sıraç (1992). Barzani, İstanbul: Fırat yayınları

Bruinessen, Martin V. (1991). Ağa, Şeyh ve Devlet: Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi, (wer. R.Aslan), Ankara: Özge

Burak, Durdu M. (2003). "Osmanlı Devleti'nde Jön Türk Hareketinin Başlaması ve Etkileri" OTAM (Ankara Üniversitesi Osmanlı Tarihi Araştırma ve Uygulama Merkezi Dergisi), v.14, pp.291-318.

Canli, Cemalettin & Uçak, H. İbrahim (2011). Hattın Dört Yanında Cemilpaşazadeler, Ankara: Dipnot

Celîl, Celîlê (1998). Serhildana Şêx Ubeydullah (wer. M.Aras), Istanbuk: Weşanên Perî

Cemil Paşa, Ekrem (1991). Muhtasar Hayatım, Brüksel: Brüksel Kürt Enstitüsü

Coles, Isabel (2014). "Kurds' battle for Syria's Kobani unites a people divided by borders", http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/10/syriakurd1629.htm lênêrîna dawî: 14.02.2016.

Çiviroglu, Mutlu. "The Constitution of Rojava Cantons", http://civiroglu.net/the-constitution-of-the-rojava-cantons/ 09.02.2016

Gellner; Ernest (2009). Milliyetçiliğe Bakmak (Encounter with Nationalism), Istanbul: Iletişim

Hakan, Sinan (2007). Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürtler ve Kürt Direnişleri (1817-1867). Ankara: Doz

Hobsbawm, E. J. (2010). Milletler ve Milliyetçilik: Program, Mit, Gerçeklik (4.bsk), Istanbul: Ayrıntı

INTERNATIONAL CRISIS GROUP (2013). Syria's Kurds: A Struggle Within a Struggle.

http://www.crisisgroup.org/~/media/Files/Middle%20East%20North%20Africa/Iraq%20Syria%20Lebanon/Syria/136-syrias-kurds-a-struggle-within-a-struggle.pdf 09.02.2016

Jwaideh, Wadie (2004). Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi (wer. İ.Çeken-A.Duran), 3. bsk., Istanbul: iletişim

Keskin, Necat (2013). "Kongreya Netewî 'dîsan' hat paşxistin!", http://necatkeskin.blogspot.com.tr/search?q=kongreya+netewî 12.02.2016.

Keskin, Necat (2014). " A Starting point towards 'unification' between Kurds: Peshmerga to Kobani", http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/10/syriakurd1628.htm lênêrîna dawî: 14.02.2016.


1 Necat Keskin (2015). "Will Kurds Make it This Time? http://ekurd.net/will-kurds-make-it-this-time-2015-08-19

(2015). "Will Kurds Make it This Time? http://ekurd.net/will-kurds-make-it-this-time-2015-08-19.

Nûrsî, Bedîuûzzeman Sêîdê (2013). Dersên Civakî (wer. A. Yıldız-A.Samur), Istanbul: Zehra

Öcalan, Abdullah (2011). Democratic Confederalism. London: Transmedia Publishing Ltd. http://www.freeocalan.org/wp-content/uploads/2012/09/Ocalan-Democratic-Confederalism.pdf 10.12.2016

Öcalan, Abdullah (2012). Kürdistan Devrim Manifestosu, Kürt Sorunu ve Demokratik Ulus Çözümü (Kültürel Soykırım Kıskacında Kürtleri Savunmak), Istanbul: Ararat

Özkirimli, Umut (2009). Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel bir Bakış (3.bsk), Istanbul: Doğu-Batı

Özoğlu, Hakan (2009). Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliği (ji ing. wer. A.-N.Gündoğan), 2.bsk, İstanbul: Kitap

Rogg, Inga & Rimscha, Hans (2007). "The Kurds as parties to and victims of conflicts in Iraq", International Review of Red Cross, v. 89, n.868, pp.823-842.

Schmidinger, Thomas (2014). Suriye Kürdistanı'nda Savaş ve Devrim (wer. S. Altınkılıç), Istanbul:Yordam

Silopî, Zinar (Ekrem Cemil Paşa) (1969). Doza Kürdüstan, Beyrut: Stewr basım-evi

Temo, Meşal (2012). "Rûpelên Zemina Welatekî bê Welat", *Seîd Weroj (ed).Geşepêdanên Rojhelatanavîn, Sûrye û Kurdistana Rojava,* Istanbul: Doz, r.31-87.

Türkmen, E. Ali- Özmen, Abdurrahim (2013). Kürdistan Sosyalist Solu Kitabı, Ankara: Dipnot.

Veroj, Seîd (2012) (ed.). Geşepêdanên Rojhelatanavîn, Sûrye û Kurdistana Rojava, Istanbul: Doz

Yazici, Nevin (2012). "Suriye Siyasi Tarihi", http://www.21yyte.org/tr/arastirma/suriye/2012/05/29/6619/suriye-siyasi-tarihi, 08.02.2016

**Web:**

- http://www.pukmedia.com/EN/KK_Direje.aspx?Jimare=17283 lênêrîna dawî: 14.02.2016
- http://www.britannica.com/event/Sykes-Picot-Agreement 30.01.2016
- http://www.jewishvirtuallibrary.org/jsource/History/sykes_pico.html 30.01.2016.
- http://www.smithsonianmag.com/history/sykes-picot-agreement-180957217/?no-ist 30.01.2016
- http://wwi.lib.byu.edu/index.php/Main_Page
- http://time.com/4003737/kobani-isis-photos/ lênêrîna dawî: 12.02.2016
- http://www.bbc.com/news/world-middle-east-29688108 lênerîna dawî: 14.02.2016
- http://rudaw.net/kurmanci/onair/tv/episodes/episode/2ali_18112015 lênêrîna dawî: 14.02.2016
- http://www.rojevakurd.com/serok-barzani-mizginiya-azadkirina-singale-ragihand/ lênêrîna dawî: 14.02.2016
- http://ekurd.net/mismas/articles/misc2014/8/state8412.htm lênêrîna dawî: 14.02.2015
- http://www.basnews.com/index.php/so/news/65020
- http://krd.sputniknews.com/kurdish.ruvr.ru/news/2013_08_16/234742521/
- http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/030920138
- http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/1011201311 lênerîna dawî: 14.02.2016
- http://rudaw.net/english/kurdistan/23072013 23.12.2015
- http://countrystudies.us/syria/23.htm 08.02.2016

http://www.crisisgroup.org/~/media/Files/Middle%20East%20North%20Africa/Iraq%20Syria%20Lebanon/Syria/136-syrias-kurds-a-struggle-within-a-struggle.pdf 09.02.2016

- http://ozgur-gundem.org/haber/149657/demokratik-ozerlik-ve-ozyonetim-bir-statu-talebidir. 16.11.2015